

Berlin, di 5. 6. 2000

-Çapa Duwe-

Li ser Tirba Şêro

Destana Şêro

Ev perçê pêşî ji Destana Şêro ye, yê ku ew di şerê Henderîn de di sala 1966 de hatîye bikuştin.

Ez dixwazim di vê Destanê de evîndarî, bîr û bawerîya Şêro ji bona civaka wî, ji bona Kurdistanâ wî bidim bîdiyarkirin. Şêro yek ji wan Qehremanên Pêşmergeyêne me ne, ji Mezintirîn Lehengê dîroka me ne û ji Perestirîn Lawêne Kurdistanâ me ne.

Ez vê Destana Şêro ji bona Pêşmergêne Kurdistanê diyarîdikim.

Berlin, di 8. 2. 1967 de

Li ber laşê Şêro

Ax Şêrê min!
 Ax Lawê min!
 Cerg û hinavê min.
 Vame îro li ber laşê te me.
 Ev bîst û yek sal
 her tu
 evîn û hêvîya rebena dêya xwe bû.
 Tu bû,
 hêz û hinera min.
 Tu bû
 mirêka xweşbûna jîna min.
 Îro vaye tu çû.
 Vegera te nama.

Ax Şêrê min!
 Ez û tu bi tenha xwe bûn.
 Çardeh salan,
 min tu xwedîkir,
 bi parsitîyê,
 bi rebenîyê,
 bi perîsanîyê.
 Çardeh salan
 tûrê parsê ji milêñ min
 nehate xwar.
 Ez û tu pê dijyan.
 Navê min,
 navê te hatin biguhertin.

Ji Jîna Gavanê gund,
ji Lawê Gavanê gund,
ez û tu bûn
Parsekê Gund.
Bavê te
Gavanê gundê me bû.
Berî tu bê dinê
ew bi tang û topê
Hovberên Dujmin ve
hate bikuştin.
Çavên te vebûn li dinê,
di wêranîyê de
di şer de,
di cengê de,
di kuştin û talanyê de.
Berî te min
pênc Zarok veşartin.
Tu bû yê dawî.

Ax Şêrê min!
Roj bi roj
gava tu mezin dibû,
ez kêfxweş dibûm,
dilşad dibûm.
Min dizanî
pars namîne pişk û para min.
Bi merisî,
qirêjî
namîne
dergevanê dergehê mala min.
Jîyan min didît
di karê te de,
di xwêdana xebata te de.
Parastina hebûna xwe
min didît
di mezinbûna te de.

Lawê min!
Tu bû çaredeh salî.
Te jî da ser rêça
Bav û Kalên xwe.
Tu jî bû Gavanê gundê xwe.
Bi dilşadî,
bi serbilindî
her êvar
ez diçûm
mal bi mal nala berê.
Min bangdikir,
ka nanê me.
Ji wê rojê de
parsê hilanî warê xwe,
koça xwe

jî nava mala me.
min tûrê xwe,
tûrê te
herdu çirandin,
tarwarkirin,
avêtin nava agir.

Ax şêrê min!
Ax delalê min!
Her êvar
gava tu ji kar dihate mal,
min dida te dêhn û bala xwe.
Min di te de ne didît nala bavê te.
Wî limêj û rojî nedibir li xwe,
dixwend Yasîn û Quran
li ser Bav û kalên xwe,
her dem diçû cem Şêx
ser tewandî,
bi çarlepkan,
bi tirs,
diçû dest û pîyêñ wî.
Bibû Sofî, Sofiyê mala Şêx.
Bi rî û tizbî,
nezan û bedbext.
Di koncêdê,
her roj dikşandin werdêñ xwe.
Heta hate bikuştin jî,
weha bû jîna wî.

Lê te
her êvar
xwe hînî xwendinê dikir.
Te ne dixwendin yasîn,
ne jî quran.
Na.
Te ji min re surûd digotin.
Te navê Şêx netanî,
nejî navê Pêxember.
Tucarî min ji te nebihîst,
ne li ser
çûna bihuştê,
ne li ser tîrsa dujehê,
lê her û her
li ser zimanê te bû
navê Kurdistan, navê Kurd.
Te ji min re
her êvar
dida bixuyanîkirin,
bê çima em
perçe perçe bûne,
hejar
perîşan em dijîn
di nava welatê xwe

Kurdistan de.
 Roj bi roj ve
 diyar dibû
 ji min re
 armanca te,
 ayîna te
 di jînê de.
 Te ji min re digot:
 Em ne hatinê dinê,
 ku em bijîn
 di perîşanîyê de,
 di birçîbûnê de,
 di nezanîyê de,
 di bedbextîyê de,
 di paşvemayînê
 û di tirsê de.
 Na.
 Em nehatine dinê,
 ku em bi bê parbin.
 Em hatine dinê,
 ku em her û her
 serbest û azadbin.
 Em hatine dinê,
 ku em xwedanê welatê xwe bin,
 xwedîyê dewlemendî
 û hatina welatê xwe bin.
 Lê îro
 pişk û para me ye
 kuştin û talankirin;
 jiber ku dujmin
 li ser sînga welatê me ye.
 Her ku em serên xwe berzdkin,
 da em jî nala Merovan bijîn,
 dujminen hovber
 Kurdistanê wêrandikin.
 Bi hezaran, sedhezaran bê guneh
 tevan didin ber gulên
 tang, top û balafiran.
 Ger em jî li vê jînê de
 nala Merovan bivên bijîn,
 divê şûreş li ser vê zor û sitemê de
 bête bikirin.

 Ax Şêrê min!
 Ax Lawê min!
 Sê salan tu ma
 bi Gavanê gundê me.
 Sê salan
 weha bi xwesî, bextiyarî
 me bi hev re date biderbaskirin.
 Nema pîra Dêya te hustê xwe ditewand
 li ber dergehê malên gond.
 Nema pîra Dêya te
 jêre pêwistbû destê xwe

li ber vî yanjî li ber wî dirêj bike.
 Min dixwest jinekê ji te re bînim.
 Lê kî wê Lawê Gavan bike?
 Ma kî wê Keça xwe bi Lawê Parseka,
 Hejara, Perîşana gundê me bide?
 Ma kî bi bê pere,
 bê qelen
 dê Keça xwe bida me?

Ax Şêrê min!
 Ax Lawê Min!
 Berî sê sal derbasbin,
 careke din li Kurdistanê de
 ceng û şer destpêkir.
 Careke din Tang, top Balafiran
 wêrankirin bajar û gundên me.
 Careke din bi hezaran
 sedhezaran bê guneh
 dan ber tang û topan.
 Bi hezaran bê guneh
 careke din hatin bikuştin.
 Careke din, lê vê carê
 ji her car bêtir Hovberan
 hovîtiya xwe diyarkirin.
 Xwîn li çar kenarê Kurdistanê de,
 li her der û cî de dane birijandin.
 Kal û Pîr,
 Pîrekên bizik,
 bê dilovani, bi hovîti ve dikuştin
 Dergûsên ber pîyan,
 zarokên ber pêşîran
 li ber çavê Dê û Bavê wan
 ew davêtin ser bênderan, serpûş
 agir bi wan dixistin.
 Belê Lawê min,
 ew zarokên bê guneh
 didan bikuştin;
 jiber ku ew Kurd bûn
 û ew hatibûn bi dinê.

Ax Şêrê min!
 Ax Lawê min!
 Roj bi roj ve
 tebat bi te nediket.
 Roj bi roj ve
 xwîna te dikelîya.
 Roj bi roj ve
 kîna te li ser Dujminê Hovber.
 Dujminê xwînmij sînor jê re nediman.
 Her roj
 te Xortê Gund
 bi dizî ve li hev dicivandin.

Te ew hînî tifingê dikirin.
 Te ew bi rêk û pêk ve dixistin,
 da ku ew her roj
 nûçeyên Dujmin bi şûreşê ve bighînin.
 Tu nema li gund bi tenha xwe bû.
 Xortêñ gund
 çi biçûk,
 çi mezin
 tevde nala te bûn.
 Tevde bibûn nala pilingê ji agir,
 Şêrêñ Kurdistana te bûn,
 Nebezêñ nala çiyayêñ te bûn.
 Şev û roj hûn ranedizan,
 reman û xebat karê we bûn.
 Mal bibû cihê civatê,
 civata Xortêñ gund.
 Her êvar gava hûn ji hev beladibûn,
 tev bi hev re hûn radibûn ser xwe
 bi yek dengî berz dibû
 surûdê Eyreqîb.

Ax Şêrê min!
 Ax Lawê min!
 Tê bîra min,
 tê ber çavêñ min
 roja dawî,
 gava ez û tu li ber tufukê bûn,
 me xwe li ber agirê kayê de germdikir.
 Ez ketibûm mitalan,
 ji xwe re ez diponijîm,
 te ez ji nişkê ve şiyarkirim.
 Yadê!
 Te ji min re weha bi dengekî zirav ve,
 bi çavekî birûskî ve got:
 Ev êvar êvara dawî ye,
 ku ez û tu
 bi hev re dimînin.
 Ez nema dikarim bi te re bimînim.
 Ez sibehê êvarê dirim şûreşê
 dibim Pêşmerge.
 Te ez dame dinê,
 te ez bi tûrê prasê ve,
 bi rebenîyê ve
 bi hejaryê ve
 xwedîkirim,
 ne ji bona ku ez û miletê xwe
 bi Kole û Bendêñ Hovberan bibin.
 Na!
 Yadê.
 Ez ne ji bona wilo hatime dinê.
 Ez divêm xwe,
 hebûna xwe
 ji bona Kurd û Kurdistana xwe
 bidim bigorîkirin.

Kurdistan divê
ji destê Hovberên xwînmij azad bibe.
Kurdistan divê bibe bigoristan
goristaneke teng û tarî
ji bona Dujminêñ hovber;
jiber ku ew dixwazin Kurd qirbikin.
Yadê!
Çend sal mane ji jîa te,
min nedixwest careke din
tûrê parsê têkeve milê te;
lê dengê nalîna welêt tê guhê min.
Hewara bi hezran
ji Perîşan û Hejaran ji Kurdan
ji destêñ Dujminêñ hovber
dikelînin xwîna min.
Banga azadîya kurdistan,
banga serxwebûna kurdistan
birin ji te evîna min.
Me Xortêñ gund
biryardaye,
ku sibehê êvarê
em bibin bi Pêşmerge.
Hêz û hiner niye,
ku li ber me de bigire ber.

Ax Şêrê min!
Ax Lawê min!
Wek niha
tê bîra min,
tê ber çavêñ min
ev gotinêñ te.
Di wan de
diyârdibû vîna te.
Di wan de
diyârdibû
dilsozîoya te,
perestbûna te
ji bona civaka te,
ji bona gelê te,
ji bona Kurdistana te.

Lawê min!
Lewra min jî
ji te re
got:
Lawê min pîroz be çûna te.

Xebatê ji bona kê?

Ax Şêrê!
 Hing û hinavên.
 Tê bîra min
 bîr û bawerîyên te.
 Te timî ji min re digot:
 Yadê!
 Xebata me ji bona kê?
 Min ji te re digot:
 Lawê min!
 Şêrinê min!
 Xebat ji bona xwedê,
 xebat ji bona Axê,
 Şêx û Melê,
 ji bona ku em tev bi hev re
 ji bihuştê herin.
 Ew buhuşta xweş,
 ew buhuşta şêrîn.
 Gava te weha ji min dibihîst,
 diçurisîn çavên te,
 dikelîya xwîna te.
 Na.
 Na, Yadê, na.
 Xebatê em nakin, ne ji bona Xwedê,
 ne jî ji bona Axê, Şêx û Melê,
 ne jî ji bona çûna bihuştê.
 Xwedê,
 ew vejandina remana me ye.
 Ji bona pîskirin û bêmirêskirina
 jîna jîyana me ye.
 Begler, axa û mîr
 çînîya wan
 Wênerê Dehakê evsana me ne,
 Kevjalên xwînmijêñ jîna civaka me ne.
 Her dem û çaxê
 Simsarêñ Kurdistana me ne.
 Şêx û Mela
 bazirganîya efyûnê dîkin.
 Li ku?
 Di nava kurdistana me de,
 di nava civaka me de.
 Begler, Axa, Mîr,
 Şêx û Mela
 li ser xwêdana kar û xebata me de
 bi Hovberêñ Serdarêñ Turk, Ereb û Ecem re dijîn.
 Ew bi hev re jîyana jîna me dikojîn.
 Gelempêriyâ civaka me
 hejarin, perîsanin,
 Cotkar û Palevanin.
 Tevde Kole ne,
 tev Bende ne,

bêparin, nedarin
ji keda karên xwe,
ji dewlemendîya welatên xwe,
ji mafeyê Merovanîya xwe.
Ji sedan sal de,
ji kevnar de
ew ji bona wan
her û her pişk û par.
Ew dijîn di vê jînê de,
lê ne ji bona xwe.
Jîna wan
bare li ser serênen wan de.
Jîna wan
her û her
kul, derd û birîne.
Her û her girî û şûne.
Sal bi sal
xwezî bi par.
Eve destûra jîna jîyana wane.
Dewlemendîya xakê,
hatina welatê me,
azadîya Kurdistan me
divê
ji bona xweşkirina
mirêsa jîna civaka me be.
Ji bona hilanîna
koletiyê, bendîtiyê,
bindestiyê, hejar û perîşanîyê,
birçîbûnê û bêmalîyê,
nezanîyê û nexweşîyê,
tirs û li paşvemayîyê
war û koça xwe
ji nava civaka me,
ji nava Kurdistan me.
Azadiya Kurdistanê,
serxwebûna Kurdistanê
di azadîya civaka me de,
di azadîya Karger û Cotkarê me de,
di azadîya hejar û Perîşanê me de
divê bête bidîtin.
Karger û Cotkarê me,
Gavan û Şivanê me,
tev nala Lehengê Barzanê me ne,
tev nala Qazî û Ixtî û Fuadê me ne.
Divê ew bi xwedanê Kurdistanâ xwe bin;
jiber ku azadîya Kurdistana me,
serxwebûna Gelê me,
pêşveçûna civaka me,
dewlemendîya welatê me,
hatina Kurdistanâ me,
xweşkirina jîna me
li ser xwîna bi hezaran ji yên me ne,
li ser xwêdana anîya me ne,
li ser têgihiştin û zanebûna me ye.
Bo emê ji xwêdan
û xwîna xwe bi bê parbin?

Bo dê Wênerên Dehakê evsana me,
 Kevjalên Xwînmijêñ jîna civaka me,
 Simsarêñ kurdistana me
 bi Xwedîyêñ berêñ xebate me ve bibin?

Na.

Na, Yadê na.

Em di pêşveçûna dîroka demê de,
 di rêtistik û destûra pêşveçûna civaka xwe de
 şiyar bûne.

Em hêz û hinera xwe,
 hêz û hinera Dujminêñ xwe
 dizanîn,
 baş nasdikin.

Dem di pêşveçûna xwe de
 ji bona bi hêzkirin û xurtbûna me ye,
 ew bi dijî Dujminê me ye.

Emin

Şureşvanêñ Rêberêñ azadî
 û pêşveçûna civaka xwe ne.

Xebata me,
 berê karê me ji bona gelempêriya
 Gelê me ye,
 ji bona Karger û Cotkarê me ye,
 ji bona xweşkirin
 û pêşvebirina civaka me ye.

Li ser rêya Azadîyê de

Ax Şêrê!
 Ax Lawên min!
 Azadî,
 serbestî,
 serxwebûn
 her û her
 li ser lêvên te bûn,
 her û her li ser zimanê te bûn,
 her û her
 li bîr û bala te bû.
 Gava te gotina azadîyê digot,
 çavêن te diçurusandin,
 laşê te dilerizî.
 Te digot:
 Birano!
 Hevalno!
 Azdî, ev gotina şêrîn,
 ev gotina perest,
 ev gotina xweş
 li her der û cî de.
 Ev gotina,
 ku ew di hemû
 zimanan de
 xweştirîn gotine.
 Di her dem û çaxê de
 bi milyonan ji Merovan
 jîna xwe, hebûna xwe
 ji bona wê dane bipêşkeşkirin,
 ji bona wê dane bidan,
 ji bona wê dane bigorîkirin.
 Azadî
 di kevnar de,
 di dema me de,
 li der û cî de
 bi lorandina
 bi hezaran
 sedhezaran
 ji Dêyan tête biderkevtin
 ji yên ku gelên wan
 hêjî di perişanîyê de,
 di nexweşiyê de,
 di nezanîyê de,
 di paşvemayîna demê de,
 di saw û rebenyê de têtin bijîyandin.
 Azadîya Kurdistanê,
 azadîya civaka me
 dara wê
 hêjî roj bi roj ve
 bi xwîna pîran, kalan,
 Genc û Zarokan
 tête biavdan.
 Roj bi roj ve
 ji bona wê

şûn û girî
 di nava welatê me de ye,
 di nava civaka me de ye.
 Roj bi roj
 Serdarên Turk,
 Ereb û Ecemên hovber
 jîna miletê me,
 jîna civaka me
 di bin koletiyê de,
 di bin paşvemayîna jînê de
 wê her û her dirêjdičin.
 Hovberîya wan bi pišk û para
 welatê me bûye,
 bi pišk û behra civaka me bûye.
 Bi hezaran ji Lawêñ kurd
 di tarîya zindanêñ Hovberan de
 ew şev û roj li bin qamçî û dar dijîn.
 Bi hezaran ji Dêyêñ kurd
 çavnêrîna zarokêñ xwe dîkin.
 Ew li bende vegera wanin.
 Bi hezaran sedhezaran
 ji Kurdan ew nizanin,
 ka dê sibehê, dusibehê
 ma wê çi bê serêñ wan?
 Ma ewê bêtin bigirtin?
 Ma ewê bêtin bikuştin?
 Ew nizanîn,
 bê ka jîna wan ji bona çi ye.
 Hovber
 ne bes tenê Xwînmijêñ
 dewlemendbûna xakê me ne,
 ne bes tenê ew Wêranvanêñ Kurdistanâ me ne;
 lêbelê
 ew bi Xwedanê jîna me ne,
 ew bi Xwedanê hebûna me ne.
 Hovberêñ Turk,
 Ereb û Ecem
 devsorin, bixwîn.
 Ew tevde xwîna
 Dilsozêñ Perestêñ Kurdistan me ne,
 Dilsozêñ Perestêñ civaka me ne.
 Birano!
 Hevalno!
 Di demêñ kevnar de
 di dema Bav û Kalêñ me de
 derxistina Dujminan ji nava welêt,
 berzkirina alêñ welatî bi azadîyê ve
 dihate binaskirin.
 Azadî
 di dema me de,
 di vî sedsalê me de,
 di têgihiştina Nifşê me de,
 di rewş û nîrêñ pêşveçûna çîhana me de,
 ew
 di azadîya siyasî, civakî
 û abûrî de tête bidîtin.

Xebata me,
keftlefta me,
têkoşîna me,
kîna me
ne bes tenê
dijî Hovberên Serdarê Turk,
Ereb û Ecemin;
herwehajî bi dijî
wan Hestîkojênd Kurdn jî ve,
yênu ku ew bi Dujminênd Kûrdin,
yê ku ew bi Dujminênd Kûrdistanan me ne.

Xebata me
li ser rêya azadiyê de
bi dijî Begleriyê, Axetiyê ve,
bi dijî Şêxitiyê û Sofitiyê ve
tête biderkevtin;
jiber ku ew tevde
Simsarênd Kûrdistana me ne,
Dergevanênd zindana me,
Berdevkênd Kolîdarênd me ne,
Dîwarênd ber pêşveçûna civaka me ne,
Kelemênd rêya azadiya Kûrdistane me ne.

Azadiyâ me
xweşbûna jîna me
bi azadiyâ civaka me ve girêda ye.

Azadiyâ civaka me
di şiyarbûna Karger û Cotkarênd me de,
di şiyarbûna Şivan û Gavnênd me de,
di şiyarbûna Hejar û perîsanênd me de
di kara xwe de,
di kara çînîya xwe de,
di kara civaka xwe de
di kara Kûrdistana xwe de,
di kara pêşveçûna xweşkirina jîna xwe de
tête biderkevtin.

Azadiyâ civaka me,
azadiyâ kûrdistana me

..... (Li vir de pelekî dîna 4 bi kêm ve
ji dana çapkirî ve tête biderkevtin.
Ez hêvîdarim, ku wî pelî li cihekî din de
bidim bidîtin. Cuma).

Kîne Dostêن me?
Kîne Dujminêن me?

Ax Şêrê min!
Ax Lawê min!
Berî çûna te,
rojek ji rojên zivistanê
tu bi Heval û Hogirêن xwe re bû.
Bê pêjin li ber tufikê
li dora wê hûn rûniştibûn.
Dunya êvar bû,
gûvîna bayê reşt dihat.
Ez ji nava malan ji bona
malê cem we dihatim.
Di ketina minî hundurû de
te ji Guhdarêن xwe bi dengekî
nizim ve dipirsî:
Kîne Dostêن me?
Kîne Dujminêن me?
Gava te ev pirs kir,
tevan li te dinerîn.
Her yekekî dixwest,
ku ew bi lez û bez ve
bersiva pirsa te bide.
Wan ji bersiva vê pirsê
hêsantir nedidîtin.
Wan digotin:
Dost yên Dostêن me ne.
Dujmin yên Dujminêن me ne.
Dost û Dujmin wana diyarin.
Magelo kes hene,
ku ew Dost û Dujminêن xwe
ji hev nasnakin?
Min jî gotina xwe ji bona nav gotinan
date biavêtin:
Lawê min!
Şêrê min!
Dostêن me Musulmanêن me ne.
Dujminêن me diyarin,
ew Gawir û Putperestin.
Gava te ev gotinê hanê
ji Heval û Hogorêن xwe,
ji Dêya xwe dibihîstin,
te li me çavêن xwe gerand
û date bigotin:
Dostêن me,
Dujminêن me
di armanc, sitratîcî û taktîka me de
di mayîna xwe de divê neyêtin bidîtin.
Divê ew di guhertin û pêşveçûna xwe de
bêtin bidîtin.
Dost û Dujmin divê guhertina wan
bi hev re her û her ji bona bi lezkirina
gîhandina armanca me ve
bête bigirêdan.

Çi armanca me ye
di vê dema me de,
di mirêka pêşveçûna xebata me de,
di dîroka destana me de,
di serpêhatiya xebata vî Nifşê me de,
di rewş û nîrên kurdistana me de,
di pêkanîn û pêşveçûna cîhana me de?
Armanca me di nêrîn û felsefa jîna me de
tête bidîtin.

Diyarbûna armanca me ji bona me
rêya xebata me ji bona me diyardike,
ew ji hev her û her Dost û dujminêne
cudadike, diyardike.

Armanca me,
armanca Karker, Cotkar û şivanêne me ne,
armanca Perîşan, Hejar û Rebenêne me ne.

Armanca me
azadî, serxwebûn û serfirazîya

Kurdistana me ye,
serbestî û serdarîya Perîşanêne me ne,
xweskîrin û pêşvebirina jîna
civaka me ye.

Dost û Dujimnêne me
di mirêka vê armanca me de
têtin bidiyarkirin.

Çînîya Begler û Axan
Hestîkojêne ser sergoyêne Dujminêne me ne,
Simsarêne Kurdistana me ne.

Çînîya Borcuwazîya me,
ya xortî nuh bi ser lingêne xwe ve hatî,
ya ku ew serê xwe hêdî hêdî berzdike,
dikarîbû roleke mezin
di dîroka xebata me de bilîze;
lê ji bêvacîya Dujminêne me,
ji hovberîya Serdarêne Turk, Ereb û Ecem,
ji dijwarîya xebata azadîya Kurdistan
û civka me,
ji Şiyarbûna Karker û Cotkarêne me
Borcuwazîya me di xwe de nabîne,
ya ku ew hêdî hêdî serê xwe berzdike,
ku ew xwe li ber wan şeg û pekan de
bide bigirtin.

Ew di xwe de wê mîranîyê û kara xwe
nade bidîtin,
da ku ew bi ser wê rêya xebata
bi xwîn û dirêj ve bête bikevtin,
ya ku ew bi bê hêvî ve ji bona wê,
ji bona kara wê,
ji bona serdarîyê wê tête biderkevtin.

Ew rêya tev bi xwîn û dirêj
rêya serxwebûna kurdistana me ye,
rêya azadîya civaka me ye,
rêya serdarîya Perîşan û Hejarêne me ye.
Ew bi bê hêvî, Kêşperest dibin,
Ew li nava bajaran li cihêne xwe de
rûdinin,

yanjî ew li ewropa de dijîn û
bi peyvê ve Şureşvan, Rêber
û Parêzgerên gelê me ne.
Ew li bende roja azadîyê
û xweşbûnê de bi xwe ne.
Ew bi xwe ve Sêwîyê dema me ne,
Kêsperekêna kara çinîya xwe ne,
ne Dostêna karker û Cotkarêna me ne,
ne Dostêna Hejar û Perîşanênb me ne.
Ji nîvê rêya xebatê ew xwe
ber bi paş ve didin birakisandin,
ew Hejar û Perîşanê me
bi tenha xwe ve di meydana
xebatê de dihêlin.
Ma rêya serxwebûna Kurdistana me,
rêya serbestî û azadîya civaka me,
ya tev bi rêl û kaş ve roj bi roj ve
bi xwînê ve sor dibe,
ya ku ew bêtir û bêtir
Karker û Cotkarêna me şiyar dike,
ya ku ew bêtir û bêtir
Hejar û Perîşanê me şiyar dike,
çawan Sêwîyê dema me,
Kêsperekêna, Pûlpererekêna civaka me
ji bona ser rêya azadîya civaka me,
ji bona ser rêya azadîya Kurdistana me,
ji bona ser rêya serdarîya Hejar û Perîşanê
me dê bêtin biçûyîn?
Dewlemendîya welêt
divê ya wan be.
Serdarîya Kurdistanê divê
bi serdarîya wan be.
Dewlet divê bi dewleta wan be.
Sermiyandarî divê
bi destûra civaka me be.
Lêbelê
xebat, têkoşîn, keftileft, kuştin
zindan, lêdan,
şûreş li serên çiyan de,
dujwarî û talî divê
bi pişk û para Cotkar û Karkerêna me bin,
bi pişk û para Hejar û Perîşanêna me bin.
Serdarî, Rêberî û xwedanîya Kurdistanê
divê ji bona Sêwîyê, Bêziravê, Bevacêna,
Kêsperekêna, Pûlpererekêna Borcuwazîyen me bin.
Serdarîya Hovberen Dujminen Biyanîyan
bi golêna xwînena Hejar û Perîşanêna xwe ve
bi serdarîya Sêwîyê dema xwe ve
bidin biveguhertin,
da ku em tevde bi arduwêna kargehêna wan ve
bêtin bikirin.
Heger ku ew niha bi dostêna me ne,
di pêşveçûna xebatê de dê ew bêgotin,
bi Dujminen me bin,
Bergirtvanen pêşveçûna civaka me bin.
Dostêna me,

Heval û Hogirêne me,
 hêz û hinera civaka me
 ji bona azadî û serxwebûna Kurdistana me,
 ji bona pêşveçûn û xweşbûna jîna civaka me
 her û her Karker, Cotkar, Şivan, Gavan,
 Perîşan û Hejarêne me ne.
 Ew Rêberêne, Şûreşvanê Gelê me ne.
 Ew Welatperwerêne, Dilsozêne, Perestêne
 Kurdistan û civaka me ne.
 Ew Pêşmîr û Paşmîrêne şûreşen me ne.
 Ew bi Perîşanêne Ereb, Ecem û Turk re
 bi şûreşen xwe ve di rojhilata navîn de
 dilêne Paşverûwan, Noker, Dizan û
 civatêne Impiryalizman dilerizînin
 û tarûmardikin.
 Rê û rêçan li ber wan de didin bigirtin
 û bîdadan.
 Nema ew dihêlin,
 ku ew roj bi roj ve xwîna gelê me,
 dewlemendîya welatê me bidin bimijandin,
 sal bi sal ve bi milyardan ve ji hatina nefta me,
 ji hatina Rojhilata Navîna me bidin bidizîn û bitalankirin
 û ew her û her bi Xwînmij û Keleşêne
 civaka me ve bêtin biderkevtin.
 Her û her ew nexweşiyê, tîrsê, birçîbûnê
 perîşanîyê û lipaşvemayînê ji bona nava
 welatê me,
 ji bona nava civaka me didin bixistin.
 Perîşan û Hejarêne Kurd, Ereb, Ecem
 û Turk tevde bi Dost û Hevalêne hevin,
 tevde bi hev re dile şûreşa
 Rojhilata me ne,
 tevde bi hev re mezintirîn kelemêne
 çavêne Xwînmijen me ne.
 Paşverûyen Kurd, Ereb, Ecem û Turk
 tev bi hev re Dujminêne Xwînmijen,
 Simsarêne welatê me ne.
 Tev bi hev re Hestîkojen ser
 sifra Impiryaliya Cîhana me ne.
 Ew û Impiryaliya Cîhan
 dijî reha Merovan bi xwe ne.
 Li cîhan,
 li her der û cî de
 di vê dema me de,
 di pêşveçûna dîroka cîhana me de,
 di vî sedsalê me de,
 di vê dema tevlihev de,
 bê ser û binî,
 bê ser û ber,
 du bendêne mezin
 rû li rû de
 di cîhana perîşanêne me de
 Dewlemend û Perîşan
 beramber û hemberêne hevin.
 perîşanî, nexweşî, tîrs, nezanî
 lipaşvemayî û bindestî

pişk û para Perîşanê Kurdistana me ne,
 pişk û para Perîşanê cîhana me ne.
 Herdu nala hevin,
 Lawên Jinbavê dema me ne.
 Ne Lawêن sedsalêن bîstêن me ne.
 Herdu bi hev re
 Gorîvanê Dewlemendê dema me ne,
 Gorîvanê bazirganîya dema me ne,
 Gorîvanê piropegenda xweş bi xwe ne.
 Perîşan, Hejar û Reben
 rewrewka hêviya li ber çavêن wan de
 tarwar dibe.
 Roj bi roj ve
 li ber wan de rêya dirêj, rêya dijwar,
 rêya tev bi xwîn, kul, derd û birîn ve
 diyar dibe.
 Ew dibînin, ku ew bi tenha xwe ve
 Avanîvanêن xweşkerina jîna xwe ne,
 Azadvanêن civaka xwe ne,
 Bargêsen dijwarîya xebata xwe ne,
 rû li rû de ew beramberî Xwînmijêن civaka
 xwe ne,
 beramberî hêza Impiryalîya cîhane xwe ne.
 Şûreş li her der û cî de
 dijî Xwînmijêن jîna civaka me,
 dijî Impiryalîya cîhana me
 destûra veguhertin û xweşkirina jîna
 Hejar û Perîşanê me ye.
 Şûreş,
 şûreşa Perîşan û Hejaran
 li her der û cî de,
 li cîhanê de
 xurtirîn hêz û hinera
 pêşvebirina jîna civaka me ye,
 baştirîn rêya tarwarkirin û
 herifandina hêz û hinera
 Xwinmijêن civaka me ne,
 hilanîna serdarîya Impiryalîya
 cîhana me ne.
 Şûreş,
 şûreşa Perîşan û Hejaran
 li Kurdistana me de,
 li cîhana me de
 dilê jîna Nifşen me ye,
 dilê pêşvebirina civaka me ye,
 dilê pêşvebirina civakêن cîhana me ne.
 Perîşan û Hejar li her der û cî de
 li cîhanê de ew Dost û Hevalêن hevin,
 ew Hogir û Birayêن hevin.
 Perîşan û Hejar li Kurdistanê de,
 li cîhanê de ew hêz û hinera me ne,
 ew Paşmîr û Pêşmîrêن xebata me ne.
 Tev bi hev re ew Şûreşvanê dema xwe ne,
 da ku civakêن azadiyêن serbixwe,
 jîneke xweşî bi pêşveçû ve bê şêr û ceng
 bêtin bipeydakirin.

Aşîtî konê xwe li her der û cî de bide vegirtin.
 Li cîhanê de Merov ji her celeb û reng
 bi biratî ve, bi hevaltî ve, bi xweşî ve
 têde bêtin bijîyandin.
 Weha divê li Dost û Dujmin de
 di xebata me de, di serxwebûna me de
 lê bête binêrin.

Lawê min!
 Gava te ev gotinêx xwe
 bi dawî ve dane bianîn,
 me tevan li te dinêrin,
 me hê dijwarîya bersiva te,
 berpirsiyarîya te ji bona
 serxwebûna Kurdistana te,
 ji bona azadîya civaka te dizanî.

Soro -Cuma-